# Ronahî

www.ronahi.net/ku/ | Jimar : 941 | 13-Sibat- 2022 | Rojnameya siyasî, civakî û çandî



Navnîşan

www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
@rojnameyaronahî
+963 052 423165
423165
+963 938541707

الوكيل الحصري للتوزيع
شركة الشمال
shrktronahi@gmail.com
0998723906
المكتب الرئيسي: قامشلو - دوار سوني


## Li Baselê kursa kurdî hat vekirin

**Ji bo ku Kurdî di her qada jiyanê de bê bikaranîn YXK û JXK'ê li Baselê kursa ziman da destpêkirin. Xwendevanan diyar kir ku wê xebata kursê li seranserê Swîsre belav bikin.**



Jinên Xwendekarên Kurdistanê (JXK) û Yekîtiya Xwedenkarên Kurdistanê (YXK) li bajarê Basel ê Swîsreyê bi armanca berfirehkirina karanîna zimanê Kurdî li dijî asîmîlasyon û qedexeyan, kursa ziman vekirin. Xwendekaran li Navenda Civaka Kurd a Demokratîk a Baselê dest bi dersên zimanê Kurdî kirin.
Aktîvîstên JXK û YXK'ê di daxuyaniyekê de diyar kirin ku kursên ziman ku wan bi armanca berfirehkirina karanîna zimanê Kurdî dane destpêkirin, wê tenê bi bajarê Baselê re sînordar nemîne û wê li seranserê Swîsreyê belav bikin.
Xwendekaran anîn ziman ku wê kursa ziman bi taybetî ji ciwanan û malbatan re bê dayîn û ev tişt gotin: "Berê kesî ji me bi Tirkî nizanibû, em hemû li dibistanan fêrî wê bûn. Niha em ji Tirkan çêtir bi Tirkî diaxivin. Ji ber ku her tim ji me re hate gotin ku Kurd bêperwerde ne û divê em tiştekî îspat bikin.
Tê gotin ku zimanê Kurdî ev nêzî sed sal in tune ye. Bi qedexekirina ziman re gelê Kurd bi xwe jî hat qedexekirin. Her wiha sirgûn û zordestî ji wan sedeman e ku zimanê Kurdî di pêşketina xwe de zehmetiyan dikişîne û di civakê de nayê bikaranîn.
Zimanê Kurdî ji ber dûrketina gel ji hawîrdora xwe ya xwezayî, bêparastin bûye. Bi koçkirina bajaran re Kurd û zimanê wan ê zikmakî jî paşde hatin avêtin. Jixwe axaftina bi Kurdî jî wekî şerm dihat dîtin. Lê Kurdî zimanekî pir dewlemend e. Encax ji ber ku zimanê Tirkî zimanê perwerde û îdarî bû, zimanê Kurdî di bin xeteriya tunebûnê de ma.
Kurdî êdî weke berê nayê înkarkirin, lê pêwîstî bi tevlêbûna zêde heye. Bi hişmendiyeke neteweyî tevgerîn, ziman diparêze û pêş dixe. Bêyî hişmendiyeke wiha, şansê ziman tune ye ku bimîne. Ji bo vê jî em ji bo parastina zimanê Kurdî dixebitin û em dibînin ku ev xebat bandor û bandoreke erênî li siyaseta Kurd kiriye. Tevgereke siyasî ya ji bo maf û azadiya Kurdan têdikoşe, divê xwe bi Kurdî îfade bike. Tişta ku di vir de bi taybetî girîng e ew e ku zimanê Kurdî di hemû pêkhateyên sazî û dezgehan de cihekî fermî werdigire û di jiyana rojane de jî tê bikaranîn.
Lewma em dibêjin: Zimanê me rûmeta me ye!
Komeleyên xwendekarên Kurd JXK û YXK li ser parastina zimanê Kurdî li Baselê bi israr e. Divê bi qursên ziman û karanîna zimanê Kurdî di hemû qadên jiyanê de were berfirehkirin."
Mamosteyê zimanê Kurdî yê kursê Mahmût Altûn jî li dijî zextên asîmîlasyona li ser zimanê Kurdî bang li malbat û bi taybet ciwanan kir ku tevlî dersên Kurdî bibin.
***ANF***

## Pêşbirka şanonameyên kurdî

**Komîteya Kurdî ya Eurodramê pêvajoya pêşbirka nivîsandina şanomayan da destpêkirin. Li gorî komîteyê dayî zanîn, dema serlêdanê heta 15´ê Adara 2022´yan e.**

Komîteya Kurdî ya Eurodramê pêvajoya pêşbirka nivîsandina şanomayan da destpêkirin. Li gorî komîteyê daye zanîn, miracaet dikarin heta 15´ê Adara 2022´yan bên kirin. Ev cara diduyan e ku ev pêşbirkê tê lidarxistin.
Komîteya Kurdî ya Eurodramê bi daxuyaniyekê got, ew li benda miracaetên şanonûs û nivîskaran e.
Endamên komîteyê wê şanonameyên bi Kurdî binirxînin. Yek ji şertan ew e ku şanoname ne kevintir be ji 10 salan. Komîte wê di dawiyê de ji nava berheman 3 şanonameyan bineqîne. Weşanxaneya Avestayê wê van her sê şanonameyan weke kitêb biweşîne. Encama pêşbirkê wê 27ê Adara 2022´yan bê eşkerekirin. Heta 15´ê Adara 2022´yan jî miracaet dikarin bên kirin.
Kordînatorê Komîteyê şanonûs û derhêner Mîrza Metîn e. Wekî din ev kesên hanê jî endamên komîteyê ne: Berfîn Zenderlioglu (Derhêner, Lîstikvan û Dramaturg, Stenbol), Bariş Işik (Derhêner û Lîstikvan, Amed), Çetoyê Zêdo (Dramaturg, Şanonûs û Lêkolîner, Stenbol), Erdal Ceviz (Derhêner, Stembol), Helîm Yûsiv (Nivîskar û Wergêr, Wupertal), Hilmi Demirer (Lîstikvan, Wergêr, Stenbol), Kawa Nemir (Helbestvan û Wergêr, Amsterdam), Shaliko Bêkes (Derhêner, Dramaturg, Lîstikvan, Moskov), Sînan Akcan (Dramaturg, Senarîst, Stenbol), Zelal Angay (Dramaturg û Derhêner, Enqere).
Par di pêşbirka yekê de, Mistoyê Heco bi şanonameya "Na bavo hê li rawestgehê me" bûbû yekem, Kemal Orgûn bi şanonameya "Pepûk çi ye tu dizanî?" bûbû duyem û Yûsûf Ûnay jî bi şanonameya "Forsa Şêrko" bûbû sêyem.

**Eurodram çi ye?**

Eurodram tevnek e ku li ser wergera dramaya Ewrûpayê, Deryaya Spî û Asyaya Naverast dixebite û Eurodram rêxistinek e ku bi şêweyekî fermî li Luksemburgê qeydkirî ye û weqfeke li xêra cemaweriyê ye.
***Ozgûr Polîtîka***




## QUNCIKA TÊGÎNAN

| | |
|---|---|
| Antrenor (Fransî) | Fêrkarê/a werzişvanan, kesê/a werzişvanan perwerde dike. Rahêner |
| Behre | Jîrî, jêhatin, şiyan, karîn, huner, qabiliyet: Xwendekar bi perwerdeya taybet behreya xwe pêş dixin. |
| Rahêner | Fêrkarê/a werzişvanan, kesê/a werzişvanan perwerde dike. Antrenor |
| Rontgen (Fransî) | 1. Cûnek ronahiyê ye ku wêneyên hestî û hinavên mirovan yan jî nava tiştan pê tên kişandin. 2. Wêneyên bi wê ronahyê hatîn kişandin. 3. Makîneya ku ew wêne pê tên kişandin. |
| Sabotaj (Fransî) | Derbkirin, xerabkirin, pelişandin, pûçkirin: Bi çalakiyeke sabotajê hat kuştin. |
| Tansiyon (Fransî) | Fişara xwînê, zordayîna xwînê: Tansiyona nexweş pir bilind e. |
| Test (Ingilîzî) | Kirina tiştekî da bê zanîn ka wê serkeftî be yan na. Ezmûn, ceribandin, imtihan, prova |
| Tîm (Ingilîzî) | Çend kes yan tişt yên li gel hev. Deste, kom, taxim |
| Tomar | Parastina agahiyan yan berheman di ciyekî de. Qeyd, sicîl: Stiranên kevin tev tomar kirin. |
| Werziş | Spor, riyade |

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | A | ■ | K | ■ | N | Î | G | A | Ş |
| 2 | A | P | Î | K | O | ■ | O | ■ | Û |
| 3 | ■ | Z | ■ | O | ■ | A | R | A | V |
| 4 | J | ■ | A | R | D | ■ | E | W | ■ |
| 5 | Î | D | ■ | T | Î | R | ■ | Ê | L |
| 6 | ■ | O | X | ■ | H | ■ | E | N | E |
| 7 | K | ■ | A | M | A | N | ■ | E | Y |
| 8 | E | J | N | Û | ■ | A | Ş | ■ | L |
| 9 | W | ■ | Î | ■ | Î | N | ■ | R | A |

## Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | ■ | | ■ | | | ■ | | |
| 2 | | | | | ■ | | | | |
| 3 | | | ■ | | | | | | ■ |
| 4 | ■ | | | | ■ | | | ■ | |
| 5 | | ■ | | ■ | | | ■ | | |
| 6 | | | | | | ■ | | | |
| 7 | | | ■ | | | | | | ■ |
| 8 | ■ | | | ■ | | ■ | | | |
| 9 | | | | | ■ | | | ■ | |

**ÇEP-RAST**

1. Baneşana kêfxweşiyê... Pirsek di rewşa tewandî de
2. Roja piştî îro... Sureyek Quranê
3. Agir... Paldêr, ajo
4. Xweliya piştî şewatê... Vexwarina sereke
5. Eşîr, qebîle, hoz... Jin an jî mêrê ku hevsera/ê wî/wê miriye
6. Xwarina piştî şîvê ku derengiya şevê tê xwarin... Alava ku datînin ser hespan û li serê siwar dibin
7. Îşaret, şop... Diya dê û bavê mirovan
8. Cînavka pirhejmariyê ya xwerû... Sir, tiştê her kes pê nizane
9. Cihê herî kûr ê okyanûsan û devera ku tîrêjên rojê nagihîjinê... Di zimanê zarokan de lêxistin

**JOR-JÊR**

1. Darê ku kesên mîna hikumdar, mirovên dînî ku wekî sembola hêzê bi kar tînin... Rengek
2. Kurteya rêxistina rizgariya Îrlandayê... Kesê ku nezewiciye
3. Cureyekî xwînê... Dijberê rengî spî... Notayek
4. Ji vir û şûnde, ji niha pê de... Cejn, eyd
5. Danekî rojê
6. Bizina kovî
7. Ji bo dem û zeman, nîveka destpêk û qedanê... Gemara heywanên bibask
8. Cihê ku maden û xwê jê tê derxistin... Vexwarineke bi alkol
9. Alif, xwarina sewalan... Îrade... Hejmarên du, çar, şeş, heyşt û hwd.


Ronahî

www.ronahi.net/ku/ | Jimar : 941 | 13-Sibat- 2022 | Rojnameya siyasî, civakî û çandî



## Êrişa DAIŞ'ê berdewamiya Komploya 15ê Sibatê bû

Helwest û rola hêz û dewletan teqez dike ku ev êriş DAIŞ`ê bi serê xwe nekiriye; li pişt perdeyê komplogerên 15'ê Sibatê hebûn. Mûnîr Edîb jî diyar kir ku Koalisyona Navneteweyî bi stratijiya tinekirina DAIŞ`ê tev nagere û DAIŞ jî hêza xwe ji hevkariya Tirkiyê û hêzên qaşo li hemberî çeteyan şer dike, digire. ***R-4***



# 15`Ê SIBATÊ RÛREŞIYA DÎROKÊ YE

# KOMPLO BÎ SER NEKET Û WÊ BI SER NEKEVE



# "Me hêz ji perspektîfa Rêber Apo girt"

**Hevseroka desteya Diravî ya herêma Firatê Firyaz Berkel têkildarî salvegera komploya navnetewî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan got: "Em xwe dispêrin bîrdoziya Rêberê xwe, me şoreş û pergala nû jî li ser vî bingehî ava kir û em diparêzin."**

Li Rojavayê Kurdistanê-Bakur û Rojhilatê Sûriyê girêdana gel ya bi Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re ji salên 1979`an de destpê kiriye û heta vê rojê didome. Bi destpêkirina aloziya Sûriyê re, gelê Rojavayê Kurdistanê ku xwe li ser bingehê bîrdoziya bi Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan rêxstin kirbû ku bi wê hêzê şoreşa 19`ê Tîrmehê di 2012`an de li darxistin. Di nava pêlên şoreşê d pergala xwe ya civakî li ser wî hîmî honan, ji lewra pergala Rêveberiya Xweseriya Demokratîk ku xwe dispêre Şaristaniya Demokratîk ava kirin. Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan têkildarî vê mijarê dibêje: "Heger Netewa Demokratîk ruh e, Rêveberiya Xweser jî bedena wê ye." Rêveberiya xweser ev ji bo xwe kir rêgeza xebatê û li ser wê dest bi ji nû ve avakirinê kir. Têkildarî vê mijarê hevseroka desteya Diravî ya herêma Firatê Firyaz Berkel axivî.

Firyaz Berkel di destpêka gotina xwe de komplo û encama wê wiha şirûve kir: "Di vê mehê de hemû roj ji bo me tarî ne, di vê mehê de dewleta tirk û gelek dewletên navnetewî jî Rêber Apo di encama komployekê de girtin. Hêzên serdest û hegemon biryara qirkirina gelê Kurd dabûn, ji lewra komployeke bi vî rengî hat pilan kirin. Lê belê Rêber Apo bîrdoziyek ji me re pêşkêş kir, ji ber vê me bi vê felsefeyê bawer kir û di hundir xwe de çand. Seroketî jî behs dike û dibêje ku ez fîzîkî di girtîgehê de me, lê fikir û ramanên min di nava gelê min de ye. Mirov dikare mînakekê jî li ser vê mijarê bide, dema ku mirov xaniyekî ava dike yê herî dijwar çêkirina zemîn e. Ji ber vê yê me weke gelê Kurd Rêber Apo zemînekî bihêz û xûrt ji me re ava kir, ji bo vê jî lêkirin hêsantir bû. Li ser vê bingehê me dikarbû ku em gavên gelek mezin bavêjin, bê guman ev gav ango piroje bi rengekî pilankirî hatin çêkirin. Pergala ku îro li Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî tê bi kar anîn, berhemên bîrdoziya Rêber Apo ye."

**"Me hêz ji perespekfîta pêşengiya jinê girt"**

Firyaz Berkel bal kişand ser rola jin di şoreşa 19`ê Tîrmehê de û got: "Rêber Apo gelek xebat, piroje û perspektîf ji me re hîştin, ji ber vê bi taybet weke jin me di nava vê pergalê de lêkolîn kir, xwe perwerde kir û em roleke çawa di nava civakê de bilîzin. Dema ku di 2011`an de Bihara Gelan destpê kir, jinan jî cihê xwe di wan serhildanan de girtin. Lê jinan daxwazên xwe yên ji bo nasname û mafê jin pêkêş nekir, daxwazên wan yên di wan çalakiyan de weke yên giştî bûn. Lê şoreşa ku li Rojavayê Kurdistanê destpê kir û çirûska wê ya yekemîn li Kobanê bû, di destpêkê de jinan behsa azadiya xwe kirin, her wiha behsa wekhevî û mafê xwe yên di qadên siyasî, leşkerî, aborî, civakî, tendiurstî û di cihên biryarê de kir. Jinan bi îsrar têkoşîna bi destxistina van xalan kir ku me daxwazên xwe bi cih anîn. Ji ber vê şoreşa me bala tevahî cîhanê kişand."

"Em li dijî hişmendiya paşverû têdikoşin"

Firyaz Berkel wiha dirêjî da axaftina xwe: "Di pergala Rêveberiya Xweser de wekheviya zayendana xaleke girîng e. Di pergala dewletên desthilatdar de jin weke wezîfedar dixebite, lê di Rêveberiya Xweser de jin di tevahî cihên biryarê de di komîn û heta meclîsên herî bilind de cih digre. Ev jin ne weke şekl cih digirin, lê belê xwe bi bîrdoziya Rêber Apo perwerde dikin, xwe û civakê jî birêxistin dikin. Bê guman mirov nikare di çend salan hişmendiya civakê bughere, ji ber vê li rex destkeftiyên jinan heta niha gelek jin bi tundiyê re rû bi rû dimînin. Ev hişmendiya baviksalar û serdest ya mêr li kêleka dijmin, dijminekî din e. Em dîsa jî bi ramanên Rêber Apo têkoşîna li dijî vê hişmendiyê dewam dikin."

Hevseroka Desteya Diravî ya herêma Firatê Firyaz Berkel di dawiya axaftina xwe de destnîşan kir ku komplo encam negirt û got: "Her ku bîrdoziya Rêber Apo belav dibe û pirojeyên wî pêk tên, hêzên komploger tecrîda li ser Rêber Apo girantir dikin. Ew hêz hewil didin ku bi girankirina tecrîdê re gelê Kurd dorpêç bike, destkeftiyan têk bibe, hebûna Kurdan qir bike û bide ji bîr kirin. Lê ev yek tu carî pêk nayê, a niha di nava pergala Rêveberiya Xweser de gelek pêkhate cih digirin. Ew ji me re dibêjin Rêber Abdullah Ocalan ne tenê yê gelê Kurd e, ew rêberekî netewî ye. Her wiha di gelek zanîngehên cîhanê de pirtûkên Rêber Apo tên xwendin. Ev nêrîn teqez dike ku bîrdoziya Rêber Apo ne milkê gelê Kurd e, lê belê ew xelasiya tevahî netewên bindest e. Me jî weke pêkhateyên ku xwe dispêrin bîrdoziya Rêber Apo biryara azadiya rêberê xwe daye. Bi taybet jî weke jin, emê pêşengiya pêkanîna vê biryarê bikin."



***JINHA/Kobanê***

# Ji El-Îmarat`ê.. Jineke Mexribî xwe fêrî zimanê Kurdî dike

**Ronahî/El-Îmarat**

**Sakîne: Dema min ev hevok bihîst min qet wateya wê nizanîbû, lê min pir jê hez kir. Herwiha min zanî ku gelê Kurd yê bakur û rojhilatê Sûriyê, bi vê hevokê hezkirina xwe ji hev re diyar dikin**

'Ez pir ji we hez dikim' Bi vê gotinê jina Mexribî ya bi navê Sekîne Bin Biryan ya 33`salî, ku ji 2014`an li El-Îmarat bi cî bûye, hezkirina xwe ji gelê bakur û rojhilatê Sûriyê, diyar kir. Sekîne bi kenekî şêrîn dibêje; Min cara yekem ya kurdi bi gitina `ez qurban` bihist û bi wateya vê gitinê min xwast ez kurdî fêr bibim. Keç û xurtên neteweyên cuda, Ereb û biyanî li El-Îmarat Erebî ya Yekbûyî jiyan dikin. Bi jiyana bi hev re, ew gelan nas dikin û zimanên ku ew qet nehezirîne ku fêr bibin, jê hezdikin û xwe fêr dikin.

Sakina dayîka zarokekê ye. Piştî ew û hevjînê xwe ji hev vediqetin, ji bo pêşeroja xwe û kurê xwe, biryara rêwîtiyê dide. Sekîne kurê xwe li Mexribê li gel dayîk û bavê xwe dihîle û berê xwe dide El-Îmarat.

**Şert û mercên jiyanê ew neçarî rêwîtiyê kir**

Jina ciwan bi tena serê xwe gihaşt welatê El-Îmaratê, li ser welatê xwe tevlihev bû, lewra cihê ku gihiştiyê pirneteweyî ye. Ziman û çandên wan ji yê welatê wê cudane. Sekîne dibîje; ez pir bîriya zimanê herîma xwe dikim, şevên li xerîbiyê pir zor û tehlin.

Sekîne diyar kir ku, ji bo paşroja kurê xwe dûrî welatê xwe ket û axaftina xwe wiha domand: "Ti kes ji welatê xwe dernakeve ku ne neçar be. Tenê şert û mercên zehmet yê jiyanê, mirov rêwî dike. Lewra xerîbî pir zor û zehmete. Temenê me yê ciwan bi êş û jan li xerîbiyê derbas dibe."

Çavên wê tijî rondik dibe dema roja dûrbûyîna ji kurê wê tê bîrê û dibêje; Heft salî bû min ew li gel dayîka xwe ji bo avakirina paşerojeke baş, hişt.

Sekîne di salona bedewiyê li gel jina kurd ya bi navê Perwîn ya ji bakur û rojhilatê Sûriyê, dest bi kar kir. Ji wê demê çîroka hezkirina wê ji ziman û çanda gelê Kurd dest pê kir. Jina kurd Perwîn ya ku Sekîne gel wê kar dike, demeke wê dirêj li Îmaratê çêbibû. Pêwîstiya wê bi jinan hebû ku di karê wê de bibin alîkar. Sekîne yek ji wan bû ku li gel wî dest bi kar kir.

**"Ez qurban"**

Sekîne hevoka 'Ez qurban' ya ku beriya pênc salan ji devê jina kurd bihîsttibû, tine bîra xwe. Sekîne wiha dibêje; "Dema min ev hevok bihîst min qet wateya wê nizanîbû, lê min pir jê hez kir. Herwiha min zanî ku gelê Kurd yê bakur û rojhilatê Sûriyê, bi vê hevokê hezkirina xwe ji hev re diyar dikin."

Sekîne bi gotinên xwe yê balkêş bi hezkirin û rêzgirtina ji gel re, axaftinên xwe berdewam kir. `Jineke ciwan, ku bi tena serê xwe kar dike, bi danûstandinên xwe ya xweş û rêzgirtin, dihêla ku mirov ji gelê bakur û rojhilatê Sûriyê bi giştî hez bike bi taybetî gelê Kurd.`

**'Gelê kurd li hember çeteyên herî xeter, tekoşina azadiyê dike'**



Ramanên Sakîne ne ji aliyê erdnîgarî û ne ji aliyê siyasî ve, li ser Sûriyê hebû. Lê bi tevlîbûna wê ya li salona Perwîn re, ji kevneşopî, stran, govend û zimanê gelê Kurd hez kir. Herwiha Sekîne pîrozkirina cejna Newrozê bi hevalên xwe re li hundirê salonê ji bîr nake. Sakîna dibêje ku ew li stranên kevneşopî yên, kurdî, suryanî û erebî yên wê herêmê guhdarî dike û li ser mezheb û olên wan, agahî kom kiriye.

Li ser êrişên dawî yên çeteyên DAIŞ`ê ser bajarê Hesekê, jina Mexribî Sekîne got, `bi vê êrişa ser gelê herêmê, ez pir êşiyam. Lewra min bi saya Perwîn, gelê Rojava û doza wan fêm kir. Ew li dijî çeteyên herî xeter li ser cîhanê, li ber xwe didin.

**`Ji min re bûye xeyalek ku biçim bakur û rojhilatê Sûriyê`**

Sekîna dema serdana malbata xwe ya li Mexribê dike, bi hembêzkirina dayîka xwe re zêdetirî carekê dibêje `Ez dilê te bixum`. Dayîka wê matmayî dimîne, Sekîne bi kenekî şêrîn jî re dibîje; Dayê min ev gotin ji hevlên xwe yên kurd bihîstiye, bi vê hevokê kurdî ez hezkirina xwe ji tere diyar dikim.`

Sekîne bi hezkirina behsa hevala xwe ya kurd kir. Sekîne got, hevaleke min ya kurd heye lê ew li Ewropayê dijî. Me çar salan bi hev re li gel Perwîn kar kir. Gotinên wê yê bi zimanê kurdî di mejiyê min de mane. Ji bo ez bi kurdî pêre biaxivin, ez xwe fêrî zimanê kurdî dikim. Herî dawî Sekîne Bin Biryan wiha got, ji min re bûye weke xeyalek ku biçim bakur û rojhilatê Sûriyê. Da ku bi xelkê wê re xwarinên wan bixum û hîn bêtir çanda gelê Kurd nas bikim. Ji xaka El-Îmaratê rêz û silavên min ji gelê bakur û rojhilatê Sûriyê re heye, bi taybetî gelê Kurd.



# Li Bakur di nava pencên qirkirina çandî de, dersa zimanê hilbijartî!

**Hevseroka HDP`ê ya şaxê Mêrdînê: Kampanya dersa zimanê hilbijartî pir girîg e. Lê ne çareseriya bingehî ye. Divê civak bi zimanê xwe bawer be, jiyana bi kurdî bipejirîne, bi kampanyayên mezin bixebite û bi tiştên piçûk neyê xapandin.**

**Serbest Etê-Qamişlo**

**`Ji bo qirkirin û tinekirina Kurdan zimanê wan tê qedexekirin`**

Li ser kampanya dersa zimanê hilbijartî ya zaravayê kurmacî û dimilkî ya li bakurê Kurdistanê û Tirkiyê, Hevseroka HDP`ê ya şaxê Mêrdînê Pêrîhan Agaoglu ji me re axivî.

Pêrîhanê destpêkê bal kişand ser girîngiya zimên û got, zimanê her gelî nîşana herî xurt ya dîrok û paşroja wî ye. Lê mixabin gelê Kurd bi teybet li bakurê Kurdistanê heta van salên dawî jî derfetên ku bi zimanê xwe perwerdeyê bibîne nedîtiye. Sîstema desthildar bi armanca tinekirina hebûna gelê me, ziman û çanda me qedexe kirine."

**Lîstik û xapandinên desthilatê**

Hevseroka HDP`ê diyar kir ku tevî hewldana tinekirin û qirkirina çandê ya li hemberî gelê Kurd, rejima desthilatadar ya Tirkiyê li hemberî xebata û têkoşîna çandî serî li lîstik û xapan dide û ev agahî da: "Xebata doza ziman û çanda kurdî li bakur heye. Bi rastî hewldanên mezin ji aliyê me ve tên kirin. Lê ji aliyê desthilatê ve bi rêbazên veşartî ji 2012`an heta niha hê xepandina mezin didomîne. Mînak bi vekirina kanalên mîna TRT-6 dixwaze li gorî xwe û sîstemê qalibekî kurdî ava bike. Ji ber hesreta ziman ya di dilê Kurdan de, desthilat bi polîtîkayên xwe dixwaze Kurdan bixe binê kontrola xwe. Ji ber nasnekirina rastiya xwe gelek Kurd hatin xapandin û gotin, `binêrin kanala TRT-6 bi kurdî tê weşandin û dewlet derfetê dide me`. Herwiha li zanîngehên Tirkiyê hin polên zimanê kurdî hatin vekirin, lê ev tev xapandin in. Divê mirov baş fêm bike ku divê Kurd li bakur bi van polîtîkayan, neyên xapandin û bi tiştên piçûk yên ji bo xapandinê razî nebin."

**`Pirsgirêka Kurdan bi zimanê hilbijartî nayê çareserkirin`**

Li ser kampanya Dersa Zimanê Hilbijartî ya ji 3`ê Çile heta 7`ê Sibatê dewam kirî, Pêrîhan wiha axivî: "Bi rastî Kampanya dersa zimanê hilbijartî ya her du zaravayê kurmancî û dimilkî, kampanyeke pir girîng e û em jî piştgir in. Lê divê di vê astê de nemîne. Lewra em wê bes nabînin. Ji ber wê HDP`ê pêngava fermîkirina zimanê kurdî dest pê kiriye. Li hemberê vê pênagavê, bi zimanê hilbijartî AKP-MHP dixwaze asteng bike. Divê bê zanîn ku pirsgirêka Kurdan ya çandî bi dersa Zimanê hilbijatî nayê çareserkirin."

Hevseroka HDP`ê ya şaxê Mêrdînê diyar ku ji bo formata çareseriyê ya çand û ziman, divê civak hêza xwe bike yek û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Li tevayiya gund, bajar û herêman bi hev re em li hemberî xapandinên dewletê bisekinin. Li ser vî bingehî divê kampanyayên mezin



û biencam dest pê bikin. Jiyaneke bi kurdî ji aliyê Kurdan ve bi bawerî bê bejirandin û bijîn. Di her milê civakê û jiyanê de, divê zimanê kurdî bê zindîkirin. Herwiha li her dezgeh û bi her dostê xwe yê li Tirkiyê em bixebitin û zimanê kurdî fermî bikin. Berî her tiştî divê em bi bawer bin ku zimanê kurdî nasnameya me ye û bi zimanê xwe em dikarin azad bijîn".

# Berteka hunermendan li hemberî Almanya: Mîna serdema Hîtler e

**Hunermend Ferhad Merdê û Baran Gulbihar nerazîbûn nîşanî biryara Dadgeha Federal ya Almanya dan ku qedexeya li ser Mîr Mûzîkê û Weşanxaneya Mezopotamya didomîne û diyar kir ku li Almanya hê şopên serdema Hîtler hene û gotin, ha we weşanxaneyek girt, ha we êrişî bajarekî kir.**

Weşanxaneya Mezopotamyayê û Mîr Muzîk ku ji saziyên çand û hunerê yên Kurdan ên li Almanyayê ne, 1'ê Sibata 2019'an bi biryara Wezareta Karên Hundir a Almanyayê hatin qedexekirin. Piştî biryarê, polîsên Alman bi hinceta qedexeya PKK'ê dest danîn ser gelek pirtûk, CD û arşîvên her du saziyan.

Di dadgeha 26'ê Çileyê ya dozê de Dadgeha Îdarî ya Federal ev qedexe 'qanûnî' dît. Hat ragihandin ku piştî biryarê dê dozê bibin dadgeheke bilindtir.

Hunermend Ferhad Merdê û Baran Gulbahar nerazîbûn nîşanî helwesta Almanyayê da û got biryara li dijî saziyên çand û hunerê yên Kurdan nîşan dide ku dewleta Tirk û Almanya xwedî zîhniyeteke hevpar in.

Hunermend Ferhad Merdê diyar kir ku welatên kapîtalîst her tim pêşî li têkoşîna gelên bindest girtiye û got: "Aşkera ye ku dewleta Alman çi ye, her çend diyar dikin ku ew demokrat in. Helwesta wan a li hemberî gelê Kurd bi dewleta Tirk re yek e. Mafê herî xwezayî yê mirovan e ku xwe bi ziman û çanda xwe îfade bikin. Di heman demê de mafê herî xwezayî yê gelê Kurd e. Mixabin dewleta Alman bi girtina Mîr Muzîk û Weşanxaneya Mezopotamyayê helwesta xwe ya di vê mijarê de nîşan da."

**Êrişên dewleta tirkî û polîtîkaya Almanya**

Ferhad Merdê diyar kir ku dewleta



Tirk û Almanya di siyaseta xwe ya Kurdan de ji hev cuda nîn in û got Almanyayê beriya niha jî helwestên bi vî rengî nîşan dane û wiha dewam kir: "Çawa ku dewleta Tirk a bi serkêşiya Erdogan êrişî gelê Kurd dike, dewleta Alman jî polîtîkayeke bi heman rengî dimeşîne. Ne tenê ev her du sazî, gelek saziyên ku xeta azadiyê temsîl dikin jî li Almanyayê tên qedexekirin. Wek kedkarên çand û hunerê em vê rewşê şermezar dikin. Helwesta Almanyayê ya li dijî Kurdan timî neyînî bû. Di meşên li Almanyayê de jî ev yek nîşan dan."

**'Ha we sazî girtin ha we êrişî bajaran kir'**

Ferhad Merdê di dawiya axaftina xwe de bang li hemû hunermendên şoreşger kir û got: "Çawa ku hemû dewlet li dijî Kurdan dibin yek, divê em jî wek hunermend bibin yek. Wek hunermendên Rojava, ji bo ku em bikarin helwesta faşîzan a Almanyayê ya li hemberî Kurdan û gelên bindest şermezar bikin, divê em deng bidin dengê hevalên xwe yên hunermend ên li Ewropayê. Ha we sazî girtin, ha we êrişî bajarekî kir, heman tişt e."

**'Almanya rêgezên xwe binpê dike'**

Hunermend Baran Gulbahar jî bi bîr xist ku Almanya ji damezirînerên Yekitiya Ewropayê (YE) ye û wiha axivî: "Almanya xwe di normên Yekitiya Ewropayê, mafên mirovan, azadiya ramanê û wekheviya çandî de xwedî biryar û bandor dibîne. Lê dema ku em li hêlekê li normên YE'yê û li hêla din jî yên Almanya dinêrin, em dikarin bi rehetî bibêjin ku rêgezên xwe û biryarên ku mohra xwe daniye bine wan, binpê dike."

Baran Gulbahar diyar kir ku pratîka Almanyayê ji ya dema Hîtler ne cudatir e û qirkirinên di wê demê de hatin kirin îro bi qirkirina çandî dewam dike û got: "YE li ser prensîbên demokrasiyê hatiye avakirin. Lê belê pratîka dewleta Alman ne demokratîk e. Li hemberî vê yekê xwedî helwesteke neteweperest, dîktatorî û faşîzan e. Ev helwest, dema Hîtler tîne bîra me. Hîtler wê demê Cihû şewitandibûn û îro Almanya jî qirkirinê didomîne. Çi fîzîkî, çi jî ruhî be, qirkirin qirkirin e. Li Almanyayê hikumeteke nû ya koalîsyonê ya bi navê 'koalîsyona kesk-sor-zer' ava bû. Ev koalîsyona ku li ser bingeha 'sosyal demokratiyê' ava bûye, divê li gorî pîvanên damezirîner û normên Yekitiya Ewropayê tev bigere. Heke vê yekê neke, dê almanya dîsa wek 'faşîst' bê pênasekirin."

**'Çanda Kurdan bi saziyên xwe, xwe parastiye'**

Baran Gulbahar diyar kir ku çanda Kurdan xurt e û got: "Dewleta Tirk



ji dema avabûna xwe û vir ve li dijî gelê Kurd polîtîkaya tunekirin û înkarê dimeşîne. Gelê Kurd li dijî van hewldanên tunekirinê bi dengbêjan dîroka xwe nivîsand û çanda xwe bi saziyên çand û hunerê yên wekî Mîr Muzîk û Weşanxaneya Mezopotamyayê parast. Dewleta Tirk di hewldanên xwe yên tunekirina çanda Kurdî de têk çûye."

Baran Gulbahar diyar kir ku Almanya li ser axa xwe malovaniyê ji gelek gelan re dike û divê li gorî prensîbên demokrasiyê tev bigere ku ev yek jî dê ji bo wê bibe dewlemendiyeke mezin.

Hunermend Baran Gulbahar her wiha got têkoşîna gelê Kurd bê navber berdewam kiriye û piştî wê jî dê berdewam bike.

***ANHA***

# "Xala sifir ya dîrokê" bi avayiyên xwe yên nû balê dikşîne

**Di erdkolana li Girê Miraza de ku wek navenda perestgeha herî kevin ya cîhanê tê zanîn, avayiyên nû derdikevin holê. Avayiya ku xwedî dîrokek 12 hezar salî ye, dema her sal ji aliyê bi hezaran geştiyaran ve tê ziyaretkirin, erdkolana ku dewam dike bala cîhana arkeolojî û dîrokê jî dikşîne.**

Girê Miraza (Gobeklî Tepe) ku di çavkaniyên gelêrî de wekî "noqteya sifir a dîrokê" tê binavkirin û wekî navenda perestgeha herî kevn a cîhanê tê zanîn, bi berhemên daneyên ku di encama kolandinên nû de hatine bidestxistin, her ku diçe bala hemû kesan dikşîne ser xwe. Cihê dîrokî ku li nêzî gundê Xirapreşkê 18 kîlometre dûrî navenda Rihayê ye, di cîhanê de weke koma herî kevnar a pêkhateyên çandê tê qebûlkirin. Lêkolînên li Girê Miraza ku bala gelek arkeolog û dîroknasan kişand ser xwe, cara ewil di sala 1963'an de dest pê kir. Erdkolanên ku piştî xebatan dest pê kirin, ji sala 1995'an û vir ve bi hevpariya Muzeya Rihayê û Enstîtuya Arkeolojiyê ya Elmanyayê tên meşandin.



**"Bi erdkolanê berhemên nû derdikevin holê"**

Herêma ku li bajêr wek avahiya herî zêde geştiyaran ber bi xwe ve dikşîne tê zanîn, her çar demsalên salê dibe warê geştiyaran. Dema ku avahiyên di encama kolandinên arkeolojîk de hatine dîtin dîrokê ronî dikin, di erdkolanên ku par ji nû ve dest pê kiribûn de berhemên nû hatin dîtin. Arkeologan der barê kolandina ku di binê xaniyên heyî yê avahiyên xaniyên nû de hatine dîtin îdiayên nû derxistin holê. Tê îdiakirin ku dîroka Girê Miraza ya ku tê zanîn 12 hezar sal berê ye, bi berhemên nû re dihigîhe dîrokek kevn. Li qada ku avahiyên ku nû hatine dîtin tên parastin, xebatên vekolandin jî hêj berdewam dikin.

**"Nexşên li ser kêlên avayiyan balê dikşînin"**

Taybetmendiya hevpar a avahiya dîrokî ya ku ji aliyê geştiyarên xwecihî û biyanî ve tê ziyaretkirin, ew e ku 10-12 kêl bi şeklê T yê bi planeke gilovêr hatine rêzkirin û navbera wan jî bi dîwarên kevir hatine honandin e. Di navenda vê avahiyê de, du kêlên hîn zêdetir bilind li beramberî hev hatine dayîn. Li ser piraniya van kêlan kevirên bi erdê ve hatine zeliqandin sembolên mirov, dest, mil, ajalên curbecur û sembolên razber bi nepixandin an jî bi qewirîne hatine çêkirin. Nexşên mijara gotinê, bi qasî ku li deverên cih bi cih hatine xemilandin, ewqas zêde hatine bikaranîn. Tê fikirîn ku, ev kompozîsyon çîrokek, vegotinek an jî peyamek îfade dike.

**"Avayî di Lîsteya Mîrateyên Cîhanê de ye "**

Tê îdiakirin ku bikaranîna herî pêşîn a herêmê digihîje qonaxa A (9.600-7.300 BZ) a Serdema Neolîtîkê (PPN, Pre-Pottery Neolithic), ango pêşiya ji roja me ya îro herî kêm 11.600 sal berê. Li gel vê, niha ne gengaz e ku mirov çalakiyên herî kevn ên li Girê Miraza bi dîrok bike lê dema ku tu li van ev avahiyên bi îhtîşam dinêrî, dibînî ku dîroka wan digihîje Serdema Paleolîtîk û çend hezar sal hê kevntir heya epîpaleolîtîkê. Van hemûyan û mîmariya bi îhtîşam a ku di dema kolandinê de derketiye holê, Girê Miraza yekane û taybet dike. Di vê çarçoveyê de di sala 2011'an de ji aliyê UNESCO'yê ve ket lîsteya demkî ya Mîrateyên Cîhanê û di sala 2018'an de jî ket lîsteya mayînde.

***JINHA***

# Nûredîn Şakir: Edalet bingehê avakirina civakê ye

Meclisa Edaleta Civakî ya herêma Cizîrê bi dirûşma `Pêkanîna Edaleta Civakî, Misogeriya aramiya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk e` 10'ê Sibatê li Navenda Çand û Hunerê ya Mihemed Şêxo ya li Qamişlo konfransa xwe ya 3`yan li dar xist.

**Darîn Silê/Qamişlo**




Li gorî sîstema Edaleta Civakî her du salan carekê Meclisa Edaletê konfransa xwe li dar dixe. Konfransa Meclisê ya yekê 2016`an hatibû lidarxistin. Di 2018'an de jî bi dirûşma `Heqîqet Armanca Me Ye û Edalet Rêya Me Ye` konferansa meclisê ya duduyan hat lidarxistin. Lê ji ber rewşa nexweşiya Korona, herwiha êrişên li herêmê tên kirin konfransa 3`yan salekê dereng ma û 10`ê Sibatê hat lidarxistin. Di konfransê de Rêveberê Komîteya Lihevkirinê ya meclisa Edaletê ya herêma Cizîrê Nûredîn Şakir ji me re axivî. Nûredîn da zanîn ku armanca wan ya lidarxistina konfransê, sererastkirina Edaletê bi giştî ye û axaftina xwe wiha domand: "Ji bo nûkirina kar û xebata meclisê em her du salan carekê konfransa xwe li dar dixin. Tê de tevayiya kar û xebata giştî nîqaş dikin û hilbijartinên nû çêdibin. Herwiha nêrînên kesên hazir digirin û di dawiyê de biryarên girîng û baştir derdikevin holê. Lewra di karê sê salan de gelek kêmayî û pirsgirêk derdikevin, bi taybetî di milê Edaletê de gelek pirsgirêk çêdibin. Ji bo wê jî konfrans cihê çareseriyê ye, tê de biryar tên girtin û daxwazên gel tên guhdarîkirin. Divê Edalet sererast be. Çimkî edalet bingehê avakirina civakê ye, eger edalelet tinebe wê civak jî bêbingeh be."

**`Guhertina fikir ji pêkanîna zagonan girîngtir e`**

Nûredîn bîr xist ku fikir û felsefeya Edaleta Civakî ya bakur û rojhilatê Sûriyê ji Edaletên Navneteweyî cuda ye û ev xal li axaftina xwe zêde kir: "Em ne weke dewletan difikirin ku zagonan daynin û li ser



wan zagonan kesên sûcdar ceza bikin. Ev rêbaz şaş e. Çiqas ew kes sûcê wî giran be jî, lê armanca me ne zagon û dadgeh e, armanc guhertina fikir e. Di mûhakemekirinê de jî ne dadger tenê, divê civak jî tevlî biryaran bibe. Ji bo wê jî em naxwazin bi zagonan tenê sûc û mijarên heyî çareser bikin. Çimkî ev ne rêbazeke zanist û edaletê ye."

Nûredîn got, her sê salên dawî gelek doz ji bo me hatin û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Dozên herî zêde dihatin yên lihevkirinê bûn. Yên din jî weke çandinî, ticaret, avakirina xaniyan, kuştin, yên erebeyan û malbatî bûn. Nêzî 27 hezar û 591 dozên lihevkirinê hatin, ji wan 23`ê hezar û 712 doz hatin çareserkirin. Dozên bi giştî jî nêzî 35 hezar û 236 bûn ji wan 29 hezar doz hatin çareserkirin. Yên nayên çareserkirin em dişînin dadgehê û li wir çareserî ji wan re tê dîtin."

Nûredîn Teqez kir ku jin pêşenga vê civakê ye û wiha got: "Şoreşa Rojava bi navê jinê hatiye avakirin. Ji bo wê jî dijmin her tim êrişî jinê dike û desthilatdariya xwe li ser wê dimeşîne. Di van salan de gelek sûcên li dijî jinan hatin kirin. Jixwe têkiliyên me bi saziyên jinê re hene. Dozên ku li Mala Jinê neyên çareserkirin, tên gel me. Zagonên hereketa jinê li gor xwesweriya wê tên dayîn. Lewra taybetmendiyên jinê tê de tên berçavgirtin. Lê mixabin zihniyeta desthilatdar her tim dixwaze va zagonan bişkîne û bêwate bike."

**'Komplo û tecrîd li dijî edeleta mirovayiyê ye'**

Rêveberê Komîteya Lihevkirinê ya meclisa Edaletê Nûredîn di dawiyê de ji bo komploya navnetewî ya li ser Rêber Abdullah Ocalan jî wiha got: "Mixabin mirovê xwediyê Edaletê 23`ê sal in komplo li ser tê meşandin. Tecrîda ku li ser rêbertiyê tê kirin ti rûyê heq û edaletê jê re nîne. Dewleta Tirkî ya Dagîrker pîvanan ji qanûnên navnetewî esas nagire. Tirkiyê hebûna xwe di tinebûna Kurdan de dibîne. Ji bo wê jî emê hewl bidin ku edalet pêk were, da Rêbertî fîzîkî azad bibe. Wek Meclisa Edaletê em bi gelek pêngavên ji bo azadiya Rêber Apo rabûne. Emê pêngavên xwe dewam bikin û têkoşîna edaleta xwe xurtir bikin."

**Biryarin Konferansê**

Li gorî Konferansa 3`yan 19 endamên meclisa giştî ya Meclisa Edaleta Civakî ya Herêma Cizîrê hatin hilbijartin û biryarên girîng hatin dayîn.

- Ji bo civakeke exalqî û demokratîk were avakirin û pêşxistin, pêngavên perwerdeyê yên fikirî, çandî û zanistî werin vekirin.
- Li gorî rêgezên edaleta civakî, pirsgirêk bi awayekî rêxistinkirî, zanistî û pêşketî werin çareserkirin.
- Ji bo pêşxistina xebatê, kadroyên pispor werin amadekirin.
-Bi tevayiya saziyên civaka sivîl yên têkîldar re xebat were kirin da ku fikir û felsfeya edaleta civakî pêş bikeve.
-Divê komîteyeke akademîk ya pispor were avakirin da ku sedemên sûcan û cezayan lêkolînê bike, reformê pêk bîne û ji nû ve wan tev li civakê bikin.
-Komîteyên lihevkirinê bi rêya perwerdeyê werin pêşxistin.
- Kadroyên dadwerî di aliyê fikirî û qanûnî de li gorî pisporan werin perwerdekirin.
-Tevayiya kadroyên edaletê beşdarî perwerdeyên akademîk bibin.
-Komîteyeke hiqûqî ya pispor were avakirin da ku xebatên saziyên têkildar bişopîne.
-Di navbera saziyên edaletê û meclisên Rêveberiya Xweser de xebateke hevpar ji bo çareserkirina pirsgirêkan were meşandin da ku pirsgirêk bi lez werin çareserkirin.



# Li Dêrazorê ji bo 6 hezar û 500 donim zevî av hat peydakirin



**Piştî xebata 7 mehan, Gerînendeya Çandiniyê ya Hecînê xebata sererastkirina du pompeyên avê li gundê El-Behra û Xeranîc bi dawî kir. Pompe avê dide 6 hezar û 500 donim zeviyên çandiniyê.**

Piraniya şêniyên gundewarê rojhilatê Dêrazorê bi çandiniyê debara jiyana xwe dikin, lê ziyanên ku çeteyên DAIŞ'ê gihandine pompeyên avdanê li herêmê, bandoreke neyinî li çandiniya herêmê kir.

Piştî rizgarkirina gundewarê rojhilatê Dêrazorê ji çeteyên DAIŞ'ê, Komîteya Çandiniyê ya Meclisa Sivîl a Dêrazorê pompeyên avdanê sererast kir.

Komîteya Çandiniyê ya Hecîn ji sala borî ve her du pompeyê yên li gundê Xeranîcê û yekemîn pompeya li gundê El-Behra sererast kir û di destpêka meha Sibatê ya 2022'an de xebatên xwe temam kirin.

Her wiha du pompeyên mêrdînê û ya Xerbî di sala 1994'an de hatibûn çêkirin û her pompek bi qasî hezar donim dabîn dike, lê di dema kontrolkirina çeteyên DAIŞ'ê de li herêmê hate rûxandin.

Serokê Şaxê Komeleyan a Gerînendeya Çandiniyê ya bajarokê Hecîn Xelîl El-Mihemed got werşeyên teknîkê alavên kevn ên ji kar derketibûn sererast kirin.

Xelîl El-Mihemed wiha lê zêde kir: "Me boriyên kevn bi boriyên nû veguherandin, me taranseke nû yê kerebeyê bi hemû kelûpelan ve û 6 stûnên ronahiyê danîn, her wiha du odeyên xizmetguzariyê yên her du pompeyan sererast



kirin."

El-Mihemed diyar kir ku her du pompe di destpêka vê mehê de ketin xizmetê. Her wiha anî ziman ku pompe avê dide 6 hezar û 500 donim ku berê her pompeyekê tenê hezar donim av dida.

Xelîl El-Mihemed diyar kir ku daketina asta ava çemê Firatê bû sedema kêmbûna çandiniyê li herêmê bi giştî û berdewamiya daketina asta avê dê êşên cotkarên herêmê zêdetir bike.

Hêjayî bibîrxistinê ye ku di plansaziya sala 2022'an ya Gerînendeya Çandiniyê ya Komîteya Çandiniyê ya Meclisa Dêrezorê de sererastkirina 7 pompeyên avê li gundewarên rojhilatê Dêrezorê heye.

**ANHA**

# Penîr û mastê Tebqa

**Kargeha mast û penîr ya yek li herêma Tebqa, berhemên xwe li sûkên bajêr belav dike û derfetên kar zêde dike.**



Yekane kargeha mast û penîr a li herêma Tebqayê, berhemên xwe li sûkên Tebqayê belav dike û derfetên kar zêde dike. Bi ber vê yekê, kirrîna ji derve kêm dibe.

Beriya 2 salan Mihemed El-Elî li bajarê Tebqayê yekemîn kargeha mast û penîr vekir. Li kargehê nivişk, mast, penîr bi her cûreyê wê û rûnê sewalan tê çêkirin û li bazarên herêmê tên firotin.

Mihemed El-Elî xwediyê kargehê, got: "Di demên dawî de li bazara Tebqayê xwestek ji bo mast û cûreyên wê zêde ye."

El-Elî destnîşan kir ku kargeh pirr dixebite: "Her cureyê şîr û penîr çêdike. Ev kargeha yekemîn e ku li bajarê Tebqa û gundewarên wê, wan madeyan derdixe û dide bajarên din ên Bakur û Rojhilatê Sûriyê."

Xwediyên kargehên wiha piçûk hewl didin hilberînên xwe li bazara herêmê bi cih bikin, bi wê re şêniyên herêmê pê debara xwe bikin, ji ber ku kargeh şîr ji xwediyên pez dikirin.

Herêma Tebqayê jî bi xwedîkirina pez tê naskirin, lewma girîngiyê didin avakirina projeyên wiha.

Li kargehê 5 mêr û 3 jin dixebitin, rojane 600 lître şîr ji gundewarên Tebqayê dikirin. Rojane derdora 40 kîlo penîr, 40 qerîşe û 20 kîlo rûnê sewalan û nivişk derdixe.

El-Elî diyar kir ku kargeha wî hewcedariyên bazarê peyda dike, ji ber ku gelek xwaringeh berhemên kargehê dikirin û got, divê piştgiriya projeyên pîşeyî yên taybet û giştî were kirin, da ku hilberîn baştir bibe, di heman demê de rê li pêşiya kirîna madeyan ji derve were girtin û derfetên kar li herêmê zêde bibin.

***ANHA***





# HPG: Ji bo tola Garê 5 dagîrker hatin cezakirin

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê ragihand ku ji bo şermezarkirina komploya navneteweyî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û tola şehîdên Garê, 5 dagîrker hatine cezakirin.

HPG'ê di daxuyaniyê de diyar kir, ''Bi çarçoweya Pêngava Şoreşger a Cenga Xabûrê'' li herêma Metînayê dagirker kirine hedef. Di daxuyaniyê de hate gotin, ''10'ê Sibatê saet di 15:20'î de li qada Girê Milîtan ê li herêma Metînayê, hêzên me bi çekên giran li dagirkeran xistin. Di encama vê çalakiyê de konekî ku dagirker li binî bû hate îmhakirin û 5 dagirker hatin cezakirin.''

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê got, ''Ev çalakî ji bo şermezarkirina Komploya Navneteweyî ya 15'ê Sibatê û hilanîna tola şehîdên me yên leheng ên Serketina Garê hatiye lidarxistin.''

Di daxuyaniyê de ev agahî hatin parvekirin:

'' 5'ê Sibatê saet di navbera 10:00 û 12:00'an de qada Girê Cûdî yê girêdayî herêma Gundê Fileha ya Zapê ji aliyê balefiren şer 2 caran hate bombekirin.

-7'ê Sibatê saet di navbera 13:30-14:00'an de qada Girê Hekkarî ya herêma Metînayê ji aliyê balefirên şer 2 caran hate bombekirin.

-9'ê Sibatê saet di navbera 16:30'an de qada Kunîşka ya herêma Zapê ji aliyê balefirên 2 caran hate bombekirin."'

***ANF***



# Li Efxanistanê jinek û du keçên xwe hatin kuştin

**Li paytexta Efxanistan Kabûlê, cenazeyê jineke 37 salî û 2 keçên wê yên 9 û 13 salî yên hatîn kuştin, hatin dîtin.**

Li Efganistanê jin di hedefê de ne. Piştî ku Talîbanê rêveberiya welêt bi dest xist, zextên li ser aktîvîstên parêzvanên mafên jinan zêde bûn, nûçeyên binçavkirin, revandin û kuştinê jî nesekinîn. Cenazeyê jineke 37 salî ku tê diyarkirin xebatkara berê ya girêdayî Wezareta Çandê ya Efganistanê bûye, bi du keçên xwe ve bi çekê hatine qetilkirin, hat dîtin.

Hat ragihandin ku di qetlîama ku li taxa Alauddîn a Kabîlê hat kirin de jina bi navê Eidiam Obeydî hedef bûye û her du keçên wê jî hatine qetilkirin. Tgotin ku jina ciwan beriya ku Talîban dest deyne ser rêveberiyê, di beşa fînans û muhasebe ya Wezareta Çandê de dixebitî ye û di heman demê de perwerdehiya xwe li zanîngehê jî berdewam dikir.

Her wiha hat diyar kirin ku Eidiam Obeydî dayika 6 zarokan e û piştî mirina hevjînê xwe hemû



barê malbata xwe hilgirtiye ser milê xwe.

Rayedarên Talîbanê derbarê komkujiyê de hîn tu daxuyanî nedan.

***JINHA***

# Şandeya HDP'ê serdana Mexmûr û Şingalê kir

**Navenda Nûçeyan-Qamişlo**



**Şandeya HDP'ê ji bo piştgiriya xelkê penaber, serdana waregeha Mexmûr û Şingalê kir. Şandeyê ragihand ku wê rastiya Şingal, Mexmûr û êrişên dewleta Tirkan yên ser herêman, bi raya giştî re parve bikin.**

Dewleta Tirk a dagirker di 1'ê Sibatê de bi dijwarî wargeha penaberan a Mexmûrê û Şengal bombebaran kiribû. Şandeya HDP'ê ji bo piştgiriya xelkê wargehê û Şenhalê, herwiha ji bo ji nêz ve dîtina şopên êrişan serdana wargehê û Şengalê kir.

Şandeyê ragihand ku ew ji berxwedana xelkê Mexmûrê û Şengalê hêz digrin û ew ne bi tenê ne.

Şandeya Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) 10'ê sibatê serdana Şengalê kir û piştî wê berê xwe da Wargeha Penaberan a Şehîd Rustem Cûdî (Mexmûr). Şande 11'ê sibatê bi pêşwaziyek germ, kete nava wargehê.

Şandeya HDP'ê li Meclîsa Gel a wargehê bi kêfxweşiyek mezin hate pêşwazîkirin. Piştre şande çû cihê balafirên dewleta Tirk a dagirker bombebaran kirî û ji nêz ve dît. Piştî wê, şandeyê berê xwe da Saziya Malbatên Şehîdan û li wir bi sedan şêniyên Mexmûrê bi



kêfxweşî û kelecanekî mezin pêşwaziya şandeya HDP'ê kir. Li saziya Malbatên Şehîdan parlamenterên HDP'ê ji bo xelkê wargehê axivîn.

**'Emê li pey doza rewa bin'**

Parlementerê HDP'ê yê Şirnexê Hasan Ozguneş axivî û got, Em tevahî cangoriyên Şengal, Memxûr û azadiyê bibîr tînin û bejna xwe li ber wan de ditewînin. Em wek HDP soz didin ku emê heta dawî li pey doza we bin. Me xwest serdana Şengal û Mexmûr bikin û êrîşa 1'ê Sibatê ji nêz ve bişopînin. Dibe ku em li Bakurê Kurdistanê bin û ji we dûr bin, lê em bi we re dijîn û hun hertim di dilê me de ne. Dewleta Tirk bi van êrîşan carek din dan diyarkirin ku ew ji dûrî exlaq û pîvanan in. Lê emê serbikevin, ji ber ku rêya me, rêya heqîqetê ye."

# SOHR: Komên girêdayî Îranê li nêzî balafirgeha leşkerî ya Tebqayê nuqteyên xwe ava kirin



**SOHR`ê ragihand ku komên girêdayî Îranê, piştî ku hêzên alîgirên Rûsyayê ji herêmê vekişîn, nuqteyên leşkerî li gundê Xirbet Hedle yê li nêzî balafirgeha leşkerî ya Tebqayê ava kirin.**

Li gorî Navenda Çavdêriya Mafên Mirovan a Sûriyê (SOHR) komên girêdayî Îranê piştî ku hêzên alîgirên Rûsyayê ji herêmê vekişîn balafirgeha leşkerî ya Tebqayê, nuqteyên leşkerî li gundê Xirbet Hedle yê li nêzî balafirgeha leşkerî ya Tebqayê ava kirin.

Komên girêdayî Îranê li wê herêmê bendên axî ava kirin û nuqteyên xwe asê kirin. Lê heta niha sedemên sereke yên vê yekê nayê zanîn ku cara yekemîn e hêzên Îranê li herêmê bi cih dibin.

Hêzên girêdayî Feyleqê 5`an ku Rûsya desteka wan dike, beriya çend rojan ji nuqteyên xwe yên li beyara li rojavayê Reqayê vekişîn balafirgeha leşkerî ya Tebqayê ku di bin kontrola Rûsyayê de ye.

***ANHA***

# Hêzên hikumeta Şamê riyên sereke yên Sweydayê girtin



**Hemwextî kombûna şêniyan li pêşiya navenda Eyn El-Zeman ku li dijî siyasetên hikumeta Şamê xwepêşandan li dar bixin, hêzên hikumeta Şamê îro hemû rêyên sereke yên bajarê Sweydayê girtin û saziyên wê yên ewlehiyê li qadên bajêr belav bûn.**

Li gorî Navenda Çavdêriya Mafên Mirovan (SOHR) saziyên ewlehiyê yên hikumeta Şamê ji vê sibê ve li qad û rêyên sereke yên bajarê Sweydayê bi cih bûn û gelek rê bi panzêran girtin. Her wiha gelek sekvan li ser banên avahiyên hikumî bi cih kirin. Hemwextî wê, şêniyên bajêr li pêşiya navenda Eyn El-Zeman kom bûn da ku xwepêşandan li dijî siyasetên hikumeta Şamê li dar bixin.

10 mihê li dijî nuqteyên hêzên hikumeta Şamê yên li Sweydayê 2 êriş pêk hatin. Çekdarên nenas benda kontrolê ya li bajarokê Micadel kir hedef. Her wiha li bajarokê Erîqe jî çekdarên nenas bombe avêtin navenda polîsê ya bajarokê, lê tu agahî der barê windahiyan de nehatin bidestxistin.

***ANHA***

# Êrişa DAIŞ’ê berdewamiya Komploya 15ê Sibatê bû

Helwest û rola hêz û dewletan teqez dike ku ev êriş DAIŞ`ê bi serê xwe nekiriye; li piştperdeyê komplogerên 15’ê Sibatê hebûn. Mûnîr Edîb jî diyar kir ku Koalisyona Navneteweyî bi stratijiya tinekirina DAIŞ`ê tev nagere û DAIŞ jî hêza xwe ji hevkariya Tirkiyê û hêzên qaşo li hemberî çeteyan şer dike, digire.

Serbest Etê/Qamişlo

**Hewldana avakirina Xelîfetiyeke nû ya DAIŞ`ê hat şkandin**

20’ê Çilê, DAIŞ`ê bi teqandina du erebeyan li pêşiya Girtîgehan Xiwêran ya Hesekê piştre ji bo revandina çeteyên xwe li ser girtîgehê êrişeke berfireh pêk anîn. Lê QSD`ê 26`ê heman mehê, ragihand ku êriş bi temamî hatiye şkandin û çete teslim bûne. Herwiha hat ragihandin ku jimara çeteyên êrişkar 200-300 bû. Ev çete jî beşek ji wan ji herêmên dagîrkirî yên ji aliyê Tirkiyê ve, beşeke din jî ji Iraqê hatibûn. QSD’ê teqez kir ku êriş bi planeke berfireh hatiye kirin, navneda wê derveyî sînorê Sûriyê bû û bi armanca jinûveavakirina xelîfetiya DAIŞ`ê, hatbû kirin. Helwest û rola hêz û dewletan teqez dike ku di êrişê de ne DAIŞ tenê bû; li pişt perdeyê, komplogerên 15’ê Sibatê hebûn.

**Nebûna stratêjiya Koalisyonê û hevkariya Tirkiyê ji DAIŞ re**

Lêkolînerê Karûbarê Komên Çekdar û Terorist yê Mesrî Mûnîr Edîb, li ser êrişê û geşedanên herêmê ji me re axivî û teqez kir ku DAIŞ dikare bi hevkariya hin hêzan êrişên bixeter û berfireh bike; DAIŞ xwe ji nû ve çalak dike û torên xwe li Sûriye û Iraqê bi rêxistin dike.

Edîb axaftina xwe wiha domand: “Gelek sedem hene ku DAIŞ hê neqediyaye. Ya bingehî nebûna stratijiyeke navneteweyî ya şerê li hemberî DAIŞ’ê û hevkariya dewletan jê re hene ku Tirkiye ya sereke ye. Tirkiye herêmên dagîrkirî yên li bakurê Sûrîyê ji DAIŞ`ê re dike wargeheke aram. Bi vê atmosferê pêkan dibe DAIŞ jinûve herêman dagîr bike û xelîfetiya duduyan ava bike.”

**Aboriya DAIŞ`ê!**

Navenda Ewropî ya Dijterorê û Istixbaratê ECCI ya li Almanya piştî êrişa DAIŞ`ê ya ser girtîgeha Xiwêranê, 31’ê Çileyê raporek belav kir. ECCI eşkere kir ku bingehê aborî yê DAIŞ`ê ji herêmên di binê desthiltadariya Tirkiyê de ji karê qaçax, bazirganiya bi mirov û madeyên hişbir û hwd. ji karên reş tê.

**Hin bûn heyran û hin jî bûn hevkarên DAIŞ`ê!**

Hêz û dewletên ku destê wan di kûrkirin û tarîkirina aloziya Sûriyê de heye li hemberî vê êrişê bêdeng neman. Dengderxistina wan ne ji bo şermezarkirina êrişê bû. Bi daxuyaniyan heyraniya xwe ya ji DAIŞ`ê re rave kirin.

Her yek ji Rûsya, Hikûmeta Şamê, `Itîlafa Sûrî` û kesayetên kirêdarên Tirkiyê di navê de ENKS, ne li hemberî êrişa DAIŞ`ê ne tenê bêdeng man, herwiha QSD sûcdar û çeteyên DAIŞ`ê wek sivîl pênase kirin. Hewl dan bi daxuyaniyên xwe yên şovenîst, di navbera hevgirtina Kurd û Ereban de jî tevliheviyê derxin. Li aliyê din jî Hikûmeta Iraqê berî êrişa ser girtîgehê hêzên xwe li ser sînor bi cî kirin û serokwezîrê wê Kazimî bi xwe hat ser sînor!

**Tirkiyê şkestina êrişa DAIŞ şkestina xwe dît û êrişa tolhildanê kir**

Ji aliyekî din ve dewleta tirkî ya dagîrker û PDK bêdeng man! Lê piştî QSD`ê ragihand ku êriş hatiye şkestin, yekser bêdengiya xwe şkandin û bi balafirên xwe êrişî Şingal, Mexmûr û Dêrika Rojava kirin û li ber çavê hêzên grantor komkujî kirin. Herwiha Nêçîrvan Barzanî yê ku hêzên wî rastî êrişên DAIŞ`ê hatin û di encamê de sivîl û pêşmerge şehîd bûn, piştî êrişê ku hê gel şehidên xwe ji erdê ranekiribûn, bi navê gotûbêjkirina projeya gazê serdana Erdogan kir û li ser vê helwesta wî ji aliyê Erdogan spasiya wî hat kirin!

**Serçeteyekî din yê DAIŞ`ê li herêmên dagîrkirî hat kuştin**

Ji destpêka dagîrkirina Idlib, Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî ve, QSD`ê hişyarî da hêzên navneteweyî ku ev herêm bi destê DAIŞ û Cebhet EL-Nusera di binê navên cuda de bi hevkariya dewleta tirkî hatine dagîrkirin. Ev jî bi operasyona Koalisyona Navnetweyî ya kuştina serçeteyê DAIŞ`ê Ebû Bekir Bexdadî ya 27’ê Cotmeha 2019`an yê li Barîşa Idlibê ya nêzî sînorî Tirkiyê, hat teqezkirin. Li heman herêmê, 2`yê vê mehê serçeteyê li şûna Bexdadî hatî diyarkirin yê bi navê Ebû Îbrahîm Qardaş li Etma Idilbê di operasyoneke din ya Koalisyonê de hat kuştin.

**Gelo Tirkiyê Qardaş radestî Koalisyonê kir? Li hemberî wê çi girt?**

Li ser kuştina Qardaş şêkolînerê karûbarê komên terorist Mûnîr Edîb ev nirxandin kir: “Ciyê Qardaş lê dima li Idibê 800 metereyî dûrî bargeha dewleta tirkî bû. Bêguman Tirkiyê dizanî ku Qardaş li wir e. Ev jî teqez dike ku herêmên di binê dagîrkeriya Tirkiyê de herwiha Tirkiye bixwe, ji bo DAIŞ`ê wargehên aram û serbest in. Li van herêman DAIŞ xwe bi rêxistin dike û êrişên xwe organîze dike.”

Mayîna Qardaş li Idilbê bi agahiya Tirkiyê, ji aliyê gelek lêkolîner û şopdarên siyasî ve hat nirxandin. Ji bo wê gumanên gelo ‘Tirkiyê Qardaş radestî Koalsyonê kir, li hemberî wê çi girt,’ dikevin serê mirov.

Mûnîr Edîb herwisa teqez kir ku divêya kuştina Qardaş bandoreke mezin li DAIŞ`ê bike, lê ji ber ku êdî DAIŞ bi stratîjiyeke nenavendî tev digere, bandora kuştina wî kêm bû.

**`Koalisyona Navneteweyî bi stratijiya tinekirina DAIŞ`ê tev nagere`**

Li ser rastiya Koalisyona navneteweyî ya qaşo li dijî DAIŞ`ê Mûnîr Edîb ev şîrove kir: “Ne niha tenê, ji destpêka avabûna DAIŞ`ê heta roxandina wê ya 22`yê Adara 2019`an koalisyona navneteweyî di şerê li hemberî DAIŞ`ê de bi ser neket. Ev jî ji ber wê ye ku bi stratijiya tinekirina DAIŞ`ê tev nagere.”



**Êrişa DAIŞ’ê berdewamiya Komploya 15ê Sibatê bû**

Bi komploya navnetweyî ya 15’ê Sibata ya dîlgirtina Rêber Apo xwestin dawî li tevgera azadiyê, hizir û felsefeya Rêber Apo bînin. Bi berxwedana Rêbertiyê ya li Îmralî ev komplo pûç bû û negihîşt encamê. Ji ber wê komplogeran berê xwe da şêwazên din û bi tecrîda girankirî ya 23 salan komploya xwe bi rûpelên nû didomînin. Heman komploger ji destpêka şoreşa rojavayê Kurdistanê û avabûna Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê ve -ya ser pradîgmaya Neteweya Demokratîk hatî avakirin- bênavber êrişî herêmê dikin. Konsept dijberî projeya Neteweya Demokratîk ji 2011an ve bi gef, êrişên dewleta tirkî, planên havbeş yên rejima Sûriyê û Rûsya, ampargoya çaralî herwiha bi êrişên DAIŞ`ê bi şêwazên cuda dewam dike. Piştî 23 salên komployê, xwestin bi serbixin, gelê Kurd qir bikin û projeya Neteweya Demokartîk ji holê rakin. Lê bi hevgirtineke xurt ya gelên herêmê bi şervanên xwe yên QSD`ê bi berdêla şehadeta 121 şervanan, rê li pêşiya plnên wan hat girtin û serkeftina komployê ji komplogeran re dîsa kirin derd.



**Fener…**



Rêber APO herikîna domdar ya enerjiya hebûnê ye

Idrîs Henan

Hêza ku ji bo pêkanîna armancan û bicihanîna planameyan dikare enerjiyan biteqîne û bi awayekî rêxistinkirî biherikîne jê re dibêjin hêza pêşeng. Ew hêz di her dem û cihî de, di bin çi mercan de be dikare ji tinebûnê hebûnê biafirîne û ji koma kedan kedeke kolektîv a dikare bi awayekî hunerî yê herî porfesyonal kar bi ser bixe. Di heyameke wisa de çelengî û xuliqkarî esas in. Ji lewra çiqas zor û zehmetî jî hebin, biryarên stratejîk ên tendirust û di cih de tên standin. Ango terzekî jiyan rast e.

Pêşengên dînamîk ên civakê ji bo pêkanîna armancan, xwedî hêza birêvebirin û perwerdê ne. Xwedî pêşdîtineke rast a pêşerojê û cihê îlhamê ne. Çi zehmetiyên werin pêşberî wan derbas dikin, xwedî baweriya serkeftinê ne. Zana, xweşbîn, çalak û afrîner in. Hêza veguherîner a vîn, kar û têkoşînê ne.

Ji bo gelên ku têkoşîna azadiyê dimeşînin, pêşengiya dikare karakterê mirovê azad xêz bike û civakê li dora projeya serxwebûnê kom bike, hewceyek jiyanî ye. Bi gotineke din dil û hişê civakê ye ku reftarekî danûstandin, birevibirin û bandorkirina veguherîner e. Ji ber vê yekê pêşengî xwedî zanebûneke dîrokî yê berfireh e ku di hemû warên cihêreng de xwedî paradîgmaya ku dikare çavkaniyên hilberînê li gorî hewceya şoreşgerî bi fonksyon bike û bi rê ve bibe.

Di rewşek weke rewşa Kurdan de mijara pêşengtiyê pirsgirêkek kûr a cidî bû. Civaka Kurd di dirêjahiya têkoşîna xwe ya azadiyê de her li pey pergala serdest bû ku terzê jiyana wî destnîşan bike. Di vê derbarê de çiqas hewldanên raperîn û serhildanan hebin, ji ber kêmasiya di xisûsa pêşnegiyê de bi ser neketin û hatin qirkirin. Li vir gelek girîng e ku pêşengî û rêvebirî weke têgîn ji hev werin derxistin. Pêşengî wek ku me li jor qalê kiriye; hêza teqandin û herikandina rêxistinkirî ya enerjiyê ye. Rêveberî jî şiyana bicihanînê û jêhatiya ku hevsengiyê ava dike ye.

Di kesayeta pêşengiyê de êrişên ideolojîk û siyasî pêk tên ku rola wî ya avaker têk bibin û bê bandor bikin. Ev nêzîkatiya serwer ji têgîn û cewherê pêşengiyê re di komploya sala 1999`an de ya li dijî Rêber Ocalan xwe da der. Di pêşengiya Ocalan de, cara yekê ye gelê Kurd dibe hêza ideolojîk û kilîtên çareseriya aloziyan bi dest dixe. Dibe xwedî fikrên neteweyî û birêsixtin dibe. Rêber APO weke senteza dîrokî ya pêşengên Kurdan derdikeve û ji hemû beşên Kurdistanê re dibe hêviya xilasiyê û di nav Kurdan de ji nû ve baweriya neteweyî zindî dike.

Bêguman projeya li bakur û rojhilatê Sûriyê a Rêveberiya Xweser a Demokratîk diyardeya her baş e ku temsîla encamnameya pêşengiya rast dike. Tevlîbûna rojane ya gelan nava vê projeyê û pêşdebirina wê, xeta tendirust a herikîna enerjiya hevpar a gelan diyar dike. Her wiha hevsengiya dadwer a çandan û awazên hunera resen a gelan diteyisîne. Dema ku pratîka Rêber Ocalan weke (Mûcîze) tê dîtin, dêmekî pêşengiya me tevî hemû astengiyan bi ser ketiye. Ji hemû pirsgirêkên siyasî, aborî, çandî, ziman, entelektual, neteweyî, olî, exlaqî û civakî re çareseriyên guncaw afirandine û ji qeyranên heyî re jî pêşkêş kirine.

Têkoşîna Rêber APO ya azadiyê naşibe ti têkoşînên dîtir. Ne ku rêberekî Kurdan e em wisa dibêjin. Têkoşîna herî giran a hatiye meşandin, têkoşîna isbatkirina hebûna gelekî li ber keviyên qirkirinê bû. Ev xisûsa Rêber APO xisletek nû li pêşengiya Kurd û ya cîhanî zêde kiriye ku têkoşîna wî cudayî çi têkoşînên dîtir e.



# Komploya li ser Rêber Ocalan, êrişa li ser azadiya gelan e

Ebdurehman Selman: Rêber APO bi sentez û ramanên xwe pêşengiya têkoşîna azadiya gelan dike. Ji ber vê taybetiya wî, navendên hegemonik di siyaseta xwe ya li dijî gelê Kurd de her cure rêbazên qirker bi kar anîn.

Idrîs Henan-Şehba

Ji bo agirê aloziya cîhanî û herêmî mezintir bikin û êrişa qirkirina Kurd dewam bike, Hêzên hegemonîk ên xwedî projeya “Rojhilata Navîn a Nû” ji bo herêmê ji nû ve li gorî berjewendiyên xwe parçe bikin û nexşeyên nû xêz bikin, hebûna Rêber Ocalan projeyên wan asteng dike. Lewra Rêberê gelê kurd Abdullah Ocelan di 15’ê Sibata 1999’an de bi komployeke navneteweyî ravandin û li Tirkiyê li girtîgeha tîpa F ya Ewlehiya Bilind a girava Îmraliyê dîl girtin. Derheqê Komploya Navnetewi ya15 Sibatê û armanca wê Nûnerê Rêveberiya Xweser yê li Mîrnişînên Ereb ên Yekbûyî Abdulrehman Selman ji me re axivî.

**‘Xwestin civakê bikşînin nava kaosê’**

Abdulrehman Selman, destnîşan kir ku revandina Rêber Ocalan seynala destpêkirina teoriya kaos xuliqkar bû û wiha got: “Ev teorî di stratejiya xwe de xwe dispêre tunekirina kesayet, sembol û lîderên dîrokî yên xwedî bandor ku hemû nirxên civakan li dora xwe kom dikin weke astengî li pêşiya berjewendiyên xwe dibînin û hedef digirin”

Selman wiha dewam kir: “Ji bona vê yekê sîstema cîhanî ya nû xwest di şexsê Rêber Ocalan de êrişî ideolojî û siyaset azadiya gelan bike û Ocalan weke astengî ji pêşiya pratîzekirina projya xwe rake. Piştre xwest civakên pêkve dijîn bikişîne nava kaosê, pûç bike, nakokiyên mezhebî û etnîkî biafirîne û kûrtir bike. Hemû hêzên rikber ji holê rake. Piştî têkbirina hemûyan jî, xwe weke lehengê rizgarker pêşkêş bike”.

**‘Rêber Ocalan afrînerê hêza baweriya neteweyî ye’**

Selman bi bîr xist ku komploya navneteweyî yekser têkîliya xwe bi pirsgirêka Kurd re heye û ev xal anî ziman: “Têkoşîna azadiyê ya bi pêşengiya Rêber Ocalan li hember qirkirin û êrişên dewleta faşîst a Tirkiyê, bû sedema vejandina nasname û hişmendiya Kurd. Bi pêşengiya Rêber Ocalan Kurd bûn xwedî hêza baweriya neteweyî û li hemû qadên jiyanê xwe rêxistin kirin. Ji Kurdên çar parçeyên Kurdistanê û dîasporê re bû jêdera hêz û hêviyê. Rêber APO bi sentez û ramanên xwe pêşengiya têkoşîna azadiya hemû gelan kir. Ji ber van xisûsên Rêber Ocalan, navendên hegemoniyê di siyasetên xwe yên li dijî gelê Kurd de her cure rêbazên qirker meşandin”.

**‘Rêber Apo senteza vîna jiyana azad e’**

Selman di dirêjahiya axaftina xwe de bal kişand ser têgihaştina Rêber Ocalan ji cewherê projeya hêzên hegemoniya navendî re û wiha rave kir: “Rêber Ocalan ji salên nodî yên sedsaliya borî, piştî hilweşandina Sovyetan, baş têgihaştibû xeteriyên moderrnîteya kapîtalîst. Her çendî hewl da xwe ji rûbirûkirina vî gurî dûr bixe û çareseriyên guncaw pêşniyar dikirin, lê belê sîstema cîhanî ya nû ji bilî radestî û teslîmbûyînê tiştek qebûl nedikir. Ji xwe di felsefeya Rêber APO de teslîmkarî nîne, pêkve jiyan heye. Ji lewra Rêber Ocalan jî asta berxwedana li hemberî projeyên parçeker bi senteza îradeya jiyanê ya nû ava kir û li hemberî destwerdana hêzên kaosê, bi fikir û ramanên xwe pêşengiya têkoşîna hevbeş a galan kir”.

**‘Nikarin vîna Rêber Apo paşguh bikin’**

Nûnerê Rêveberiya Xweser li Mîrnişînên Ereb ên Yekbûyî Abdulrehman Selman da xuyakirin ku rastiya fikir û felsefeya Rêber Ocalan di rastiya berxwedana girtîgeha Îmraliiyê de, xwe da der ku pratîzekirina wê li Rojavayê Kurdistan, Bakur û Rojhilatê Sûriyê û Şengalê û kombûna gelan li dora projeya demokratîk a rêbertiyê, komploger vala derxistin. Selman wiha dirêjahî da axaftina xwe: “Sekin û helwesta Rêber APO, hêzên serdest mecbûr kirin ku li hesabên xwe vegerin ku êdî nikarin di ser vîna gelan a Rêber Ocalan vejandiye re gav bavêjin. Her hewldaneke binpêkirina van rêgezên Rêber Ocalan afirandine, dê krîza navendên hegemonîk kûrtir bike û ger bi gelan re li hev neke û vîna wan paşgun bike, dê wendayiyên mezin ên dîrokî bide”.

**‘Azadiya Rêber Ocalan, çareseriya piskirikên Rojhilata Navî ye’**

Nûnerê Rêveberiya Xweser li Mîrnişînên Ereb ên Yekbûyî Abdulrehman Selman carek din bi bîr xist ku azadiya gelê Kurd û gelên herêmê bi azadiya fîzîkî ya Rêber Ocalan ve girêdayî ye û azadkirina wî jî tê wateya azadkirina pêşnûmeya çareseriya hemû prisgirêkên herêmê. Selman wiha bi dawî kir: “Azadiya Rêber Ocalan girêdayî gelek faktoran e. Faktora sereke jî ya navxweyî ye ku girêdayî bilindkirina têkoşîna gelê Kurd û kombûna li dora rêbertiyê ye. Aliyek din ve pêwîste çalakiyên mafên mirovan û hiqûqî ji bo parastina Rêber Ocalan mezintir û zextwar bin. Ya ku em jê re şahidiyê dikin; tirsa modernîteya kapîtalîst ji hişmendiya jiyana hevbeş û pêkve jiyana gelan e. Îro Komploya navneteweyî bi têkoşîna hevpar a gelan ku bi ruhê berxwedana Îmraliyê re bûye yek, bi pêşengiya jinên azad, têk diçe û pratîka ramanên Rêber APO bi ser dikeve”.



# KCK’ê encama civîna xwe ya salê eşkere kir

Navenda Nûçeyan-Qamişlo

**Konseya Rêveberiya KCK’ê ragihand ku bi civîna salê pêngava ‘Dem Dema Azadiyê ye’ nirxandiye û li ser bingehê xweparastina li dijî faşîzmê, ji bo xurtkirina Şerê Gel yê Şoreşgerî, armanca azadiya Kurdistanê û demokratîkbûna Rojhilata Navî plansazî amade kiriye.**

KCK’ê bi daxuyaniyeke nivîskî encama civîna salê ya Konseya Rêveber eşkere kir.

Di daxwuyaniyê de hat diyarkirin ku civîn bi beşdariya endamên ji her qada kar, bi rengekî serketî hatiye lidarxistin û da zanîn ku li ser xeta Rêber Apo pratîka li her qada kar bi berfirehî hatiye nirxandin û biryarên gelek girîng hatine girtin.

**Plansaziyên ji bo azadkirina Kurdistanê û demokratîkkirina Rojhilata Navî**

Di daxuyaniyê de hat gotin ku, bidawînebûna Şerê Cîhanê yê 3. nîşana wê ye ku hêzên modernîteya kapîtalîst û dewletên herêmê ne xwediyên projeyên çareseriyê ne. Herwiha da zanîn ku sîstema mêtinger ya bi serweriya mêr tê birêvebirin, ne li Rojhilata Navî temû li seramserû cîhanê pirsgirêkan giran dike û mirovan di nava krîzên siyasî û civakî de dihêle.



Di daxuyaniyê de hat diyarkirin ku, di civînê de cereke din hatiye teqezkirin ku Konfederalîzma Demokratîk ku xwe dispêre paradîgmaya civaka demokratîk ekolojîk û azadiya jinê, di serî de ji bo Rojhilata Navî û tevayiya mirovayiyê riya yekane ya rizgariyê ye.

Herwiha di daxuyaniyê de hat zanîn ku plansaziyên cîvînê hemû li ser esasê xweparastina li dijî faşîzmê, pêşvebirina Şerê Gel yê Şoreşgerî ji bo armanca azadkirina Kurdistanê û Rojhilata Navî hatine kirin.

**Di sala 2021’ê de zemînê hilweşandina desthilatdariya AKP-MHP’ê hatiye afirandin**

Hat teqezkirin ku Têkoşîna sala 2021’ê li hemberî planên tinekirina têkoşîna azad û qirkirina gelê Kurd, desthilatdariya faşîst ya AKP-MHP’ê aniye ber hilweşînê. Herwiha da zanîn ku PDK’ê bi rewakirina êrişên ser Herêmên Parastinê yên Medyayê, Rojava, Şingal û Mexmûrê piştgiriya herî mezin daye desthilatdariya faşîst a AKP-MHP’ê.

Di daxuyaniyê de hat xuyakirin ku, di nava dîlgirtina 23 salan a Rêber Apo de kesekî nikariye pêşî li pêşketina têkoşîna wan bigrin, tersî wê pêşketinên girîng hatin afirandin û nêrînên Rêber Apo li Kurdistanê, Rojhilata Navî û seranserê cîhanê belav bûn. Lê hat diyarkirin ku ji bo tevgera wan, gelê Kurd, dostên wan û hêzên demokrasiyê yên cîhanê cihê rexnedayînê ye ku hê jî azadiya Rêber Apo nehatiye misogerkirin Herwiha teqez kirin ku li gorî tesbîtên civînê li seranserê cîhanê di têkoşîna îdeolojîk-siyasî de pêşket çêbûbe jî ev pêşketin ne di asta hêza paradîgmayê de ye ku Rêber Apo destnîşan kiriye. Ji ber wê destnîşan kir ku rastiya avabûn û zîhniyeta sosyalîst demokratîk a Rêber Apo divê bi berfirehî û bi bandor bê nîqaşkirin û biryarên girîng hatin girtin.

**2022 YEK JI SALÊN HERÎ KRÎTÎK E**

Hat ragihandin ku sala 2022’yan di dîroka têkoşîna azadiyê de ji salên herî krîtîk e. Li hemberî vê xeterê dihat xuyakirin ku meşandina têkoşînê bi xurtkirina stratejiya Şerê Gel yê Şoreşgerî, ji bo parastina destketiyan û têkbirina êrişan şert e. Lewma îşaret bi girîngiya rêxistinî û sekna hêzên leşkerî û gel hat kirin ku vê têkoşîna giran bi ser bixin. Herwiha hat diyarkirin ku hêza esasî projeya jiyana demokratîk û azad a li ser polîtîka, îdeolojiya rast e

**SALA HILWEŞANDINA FAŞÎZMÊ, AZADKIRINA RÊBER APO Û BIDAWÎKIRINA DAGÎRKERIYÊ**

Hat diyarkirin ku li ser bingehê Konfederalîzma Demokratîk ji aliyê perwerdekirin, rêxistinkirin û xwebirêvebirina civakê pêşengiya rast nehatiye kirin. Diyar kir ku ev jî ji ber zîhniyeta dewletperest û desthilatdarîperest a bi feraseta sosyalîzma klasîk e ku bawer dike wê bi dewletê xwe bigihîne sosyalîzmê. Herwiha bi taybetî hat destnîşankirin ku divê gel jî ji bo afirandina derfetên jiyanê û rêveberiyê li benda deverekê nemîne. Hat teqezkirin ku Têkoşîna Xurt bi civaka demokratîk a rêxistinî dikare bê meşandin

Hat ragihandin ku di cîvîna salê de, KCK`ê îrade û biryardariya xwe teqez kiriye ku têkoşîna li dijî faşîzma AKP-MHP’ê ne azadkirina bakurê Kurdistanê û demokratîkkirina Tirkiyê tenê, ev têkoşîn di heman demê de têkoşîna azadkirina her çar parçeyên Kurdistanê, parastina destketiyan û demokratîkbûna li tevayiya Rojhilata Navî be. Lewma di serî de hêzên demokrasiyê yên li Tirkiyê bang li hêzên demokratîk, jin û ciwanan ên li Rojhilata Navî kiriye ku tevlî vê têkoşînê bibin û têkoşînê xurt bikin û wiha domand: “Civîna me ya Konseya Rêveber bang kir ku têkoşîna 23 salan ya li dijî komployê bi pêşengiya Rêber Apo tê meşandin, di sala 50’î ya tevgera Apoyî de 15’ê Sibatê dest pê bike heta 8’ê Adarê, Newrozê, Hefteya Lehengiyê, 4’ê Nîsanê, 1’ê Gulanê û tevayiya sala 2022’an, li ser bingehê azadkirina Rêber Apo veguherîne têkoşîna azadkirina Kurdistanê, demokratîkkirina Tirkiyê û Rojhilata Navî. Bi vî rengî ji şervanên azadiyê yên Apoyî, sempatîzanan, gelê me yê welatparêz û dostan re di têkoşîna wan de serketinê hêvî dike.”